Berken Bereh

OSMAN SEBRÎ

Tu xelatekî bo me ji payizên bihurî
Ji hingura helbestê, ji berbanga evînê
Bi hêminî dinizilî etlasa jiyanê
Hêviyên dahatûyê te li me dide hîskirin
Kurê birîndarî ê nifşa xwe
Ccavên te ji rengê kilaman
Eeşên te dibişirinin ji serpêhatiya hezarî salan

JI NU VE

Serpêhatiya kewên ribat e a tê nivîsîn
Xewneke bi etlasa oqyanûsan neqişandî
Berî berbangê

Li rûpela dîroka miryên me zindî ne

Helbet wê jî hebû dildarek
Di tariya temezî de sebra xwe pê dianî
Bawerî bi demsalên şil mina min
Têra xwe pişpişî bûn ewrên çiyayî
Dengê bayê esmerî kevnare
Xweşik bû gul, kêra diteyisî, deşta çîmdirêj
Ev esmanê heşîni kesk

Min ji agirek kevnare hez kir
Berî ku biguhêze şiverêyan bagera zirbav
Berî ku rapêçe bajaran mija gewnede
Min ji çîrçîrokekê hez kir
Çiyayekê, ku dastan li ser dihatin gotin
Keçên xama li desmala xwe dineqişandin

Ji ber vê ye
Natbite li hêlina xwe robarê hişê min
Bihar porê çiyê dialêse bi aşkere
Reqsa hestên min e li deşta raperînan

Dêwên heft serî
Ccekên nûkle erî govan in
Qebqeba azadiyê ye li berwaran
Li kolanan, ferxikê kewan
Bi heweskarî dimijin
Guhanên tîrêjê
Ji nû ve